Kurdiname Akademik
Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 5 Mijdar 2021

International Journal of Kurdiname
Issue: 5 November 2021

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname E-ISSN-2687-5438

# BÎBLOGRAFYAYA HELBESTA KURDÎ YA KLASÎK A EKOLA BABAN

(THE BIBLIOGRAPHY OF KURDISH CLASSIC POEMS OF BABAN POETRY SCHOOL)

(بيبليوغرافي الشعر الكلاسيكى الكردي. مدرسة بابان الشعرية)

Koser Omar AHMAD*

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 25.07.2021
**Accepted // Pejirandin:** 22.11.2021
**Published // Weşandin:** 30.11.2021
**Pages // Rûpel:** 81-96

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Ahmad, Koser Omar(2021). Bîblografyaya Helbesta Kurdî Ya Klasîk A Ekola Baban, *Kurdiname*, no. 5, p.81-96

**Plagiarism/Întîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

## Kurte

Ev vekolîna bi navê “Bîblografyaya Helbesta Kurdî ya Klasîk a Ekola Baban” bi kurtî behsa jîyana helbestvanên klasîk ên kurd dike yên di nava ekola helbesta Baban de. Ji bilî danasîna helbest û helbestvanên klasîk, wê li ser form û naveroka helbestvanên vê ekolê jî bê sekinîn. Ev bîblografî nîşan dide ku di sê qonaxan de helbestvanên klasîk ên damezrêner ên ekola Baban helbest nivîsandine. Di dawiyê de, bi encamên lêkolînê re, lîsteya çavkanîyan hatiye nîşandan.

**Peyvên serekî:** helbestvanên klasîk, bîblîyografya, ekola baban

## Abstract

This paper entitled (The bibliography of kurdish Classic poems of Baban) poetry School in south , it talks about the the appearance of kurdish Classic poems in the Baban poetry school in south, in addition , it examines the form and the content of the classic poetry of poets of this school in which states a bibliography in a way which shows the founders of the classic poems of this school (Baban poetry school) in three stages, those who are the followers of this school, the paper ends with the main conclusions and the list of references.

**Key words:** Classical Poetry, Bibliography, baban

## ملخص

هذا البحث بعنوان (بيبليوغرافي الشعر الكلاسيكى الكردي. مدرسة بابان الشعرية) يتناول مسيرة الشعر الكلاسيكي الكردي ونشوئها فى المدرسة بابان. ففضلا عن التعريف على الشعر والشعراء الكلاسيك، تم التطرق عل المظهر والجوهر الشعري للشعراء هذه المدرسة، وفى نفس الوقت تم عرض سيرة التى تبين ان شعراء هذه المدرسة و الذين جاءوا بعدهم هم الذين اسسوها بثلاث مراحل متتالية. وفي نهاية البحث تم عرض نتائج البحث وقائمة المصادر بصورة اكاديمية.

**كلمات مفتاحية**: الشعر الكلاسيكي، بيبلوكرافيا، بابان

* Master in Kurdish Language and Literature, robineven98@gmail.com, http://orcid.org/0000-0001-5495-7623

**Pêşgotin**

Her wekî ku di dîroka erebî de tê gotin, helbestvan ne mirovekî normal e, û em jî di vê baweriyê de ne ku helbestvan merovên cuda ne, ew bi zimanekî tije peyvên xweş bi kar tînin û dinivîsin. Ew heman peyvê ji bo mebestên din bi kar tînin ku ew metaforên bi peyvan in. Helbestên klasîk ên kurdî yên di ekola şi'rî ya Baban de, xwedî zimanekî kurdî ne yên ku hunera xwe îfadekirinê li cem wan heyî. Wekî di nav û nîşana gotara me de derdikeve ku behsa biyografî û jiyana helbestvanên klasîk yên li Başûr (Ekola Şi'rî ya Baban-Nalî) dike, gotar di heman demê de behsa helbestên klasîk û helbestvanên vê ekolê dike. Her wiha behsa form û naveroka helbestên vê ekolê dike û wisa wê bîblografiyayê derdixe holê ku sîwaneke klasîk e. Beşa yekem ji van ekolan, nav û paşnav û sala jidayikbûn û mirina wan pêk tê.

Girîngî û sedema hilbijartina vê gotarê ew e ku gotarek din ya bi heman rengî li ser bîblografiya klasîk a kurdî kêm hatiye ber çavan, serê ewil me wekî şaşî nirxand, piştre ji ber ku ev lêkolîn li başûrê Kurdistanê ye, û ji bo ku mamoste û xwendevanên Bakur jî mifa û agahiyên zêdetir li ser helbest û helbestvanên klasîk ên vê deverê distînin me ev mijar hilbijart.

Di vê gotarê de tê armanckirin ku kalîte û destpêka helbestên klasîkî yên li Ekola Baban yên li Başûr nîşan bide û her wiha bîblografiya helbestvanên ku digotin ekola Iraqiyên li Başûr in û bi navê Ekola Baban (Nalî) tên naskirin, cihê wan nîşan bide. Her wiha em dixwazin ku xizmetê ji edebiyata klasîk a vê ekolê re bikin.

Sînor û keresteyên vê gotarê; ji ber ku klasîka kurdî û helbestên klasîka kurdî, gelek nivîs li ser hene, bi kurtî digel helbest û helbestvanekî klasîk, me sînorek ji bo lêkolînan daniye ku tenê biyografiya kurdî ya klasîk li başûr û bîblografiya helbesvanên vê beşê û tenê helbestvanên ku cihê vê ekolê li başûr û deverên ku di bin sînorê desthilata mîrektiya Baban de bûn, nîşan didin.

Gotar bi nav û nîşanê “Bîblografîyaya Helbesta Kurdî ya Klasîk a Ekola Baban” e, ji bilî danasîna babetê, wekî pêşgotin, ku destpêka lêkolînê ye, di naverokê de jî helbest û helbestvanên klasîk tên behskirin, herweha behsa dîroka edebiyata klasîk a kurdî li ekola Şi'rî ya Baban li Başûrê Kurdistanê, ligel bîblografiya helbestvanên klasîk ên vê ekolê tê kirin.

**Armanca lêkolînê bersivdana van pirsan e:**

1- Edebiyata kurdî ya klasîk, li ekola helbesta Baban (Nalî), kengî dest pê dike?
2- Rêveberên vê ekolê kî ne?
3- Sînora edebî ya ekola baban ku ye?
4- Rûxsar û naveroka helbestên vê ekolê çawa bûn?

**Helbestvan û Helbesta Klasîk**

Helbestvan ne mirovekî normal e, em hemî dikarin bibînin ku gelek şiyana me ya xwendin û nivîsandinê heye, wêneyên dar û kulîk û keç û kurên delal û çiya û gelek tiştên din hene... Em hemî dikarin wan di kaxezekê de binivîsin, lê em hemî nikarin wan di çarçoveya nivîskarekî xwedî hunereke bilind de (helbest) de binivîsin, bikin wêneyekî payebilind, em hemî nikarin vê nivîsarê biguherînin di çarçoveya lêvegereke sitûnî yan asoyî de, em nikarin

van peyvên normal bi peyvên xerîb biguherînin û bi awayekî ne asayî îfade bikin. Lê helbestvanan dikarin, helbestvan xudan zimanekî cuda ne li hember zimanê normal, ew xudan zimênekî wekî kûlîlkan in, hestekî paqij, erê ew sûreya helbestvan wek mirovên normal çêdikin.

Di wî rojê de ku Xwedê mirov afirandiye, xweliya şi'rî hişê xwe reşand, dîroka afirandina vê jenereya wêjeyî: “Wê vegere rojên beriya nivîsandinê, ew roja mirovî bîra wî dikir ku guteh û derbirîna wî rêk û rind be, qalibdar û qiyasî be, êdî di wê rojê de helbest peyda bûye.” (Komelêk mamostay zanko, 2010:143). Heta îro jî ev janir berdewam dike û bi rengekî mezin bi awayê wêjeya cîhanî û kurdî hatiye nivîsîn. Helbest, navgîna şi'ûra mirov e, şi'ûrkirina ber bi wan tiştên ku bibin ax û derd û kulan û helbestvan bi hestê wan derd û kulan derdebire. Ji ber vê yekê çemkên (xeyal, hizir, soz) wekî danasînek in ji bo helbestê.

Helbest tê îfadekirin, lê çi gotin, ne wek peyvên rojane yên normal, bi gotineke ku ji peyvên normal ên rojane cudatir e, di zanista rewanbêjîyê de bi bedewiyê hatiye rêzkirin, "peyveke tije melodî û dengê dilên delal, an jî vegotina peyvan heta radeya jêbirina giyanê helbestvan an derbirîna xemgînî yan jî xweşî û karesatan" (Berzincî, 2004: 55). Helbest tenê adetên hewa hene, çawa hewa (ba) ji aliyê erdnîgarî ve bê sînor e, dema ba tê, li xala kontrolê nasekine, ne hewceyî pasaportan e ku herin welatan, ne hewceyî pîrbûnê ye. Helbest ne xwedî şiklê wêneyeke taybet e, kes nizane ji ku tê û ber bi ku ve diçe, helbest mîna erdhejekê ye, em çawa nizanin ew kengî were û çawa were? Û em nizanin ka dê kengî helbest îlhamê bide û çawa bê. Bi awayekî bingehîn a wêjeyê ji bo miletan, çawa wêje yek ji wan warên balkêş e ku milet dikare tê de bijî û bi rengekî ku hatiye afirandin perwerde bibe. (Mihemed, 1976: 4), an çawa dikarin bibin neynika rêberiya civaka sivîl a welatan, helbest jî xwedî heman tiştî ye, ku dikare bibe neynikeke nû ji şaristaniyên welatan re.

Helbestvanên klasîk ên kurdî, ji medreseyan mezûn bûne û di destpêkê de dixwendin û di xwendina medreseyên kurdî de li ser wê edabeyata Farisî (Se'dî, Hafiz û Mewlana) û mînakên Eyatî Pîroz û Hedîsên pêxember (S) bûn ku erebî bûn.

Di klasîkên kurdî de jî, ji bilî zimanê kurdî zimanekî bilind lazim bû. Ji helbestvanî dihat xwestin ku gelek peyvên farisî, erebî, tirkî di nav helbestên xwe de bi kar bîne. Eve ji bilî wî ku wekî nefşekî rewşinbîrî bû, wisa jî wekî wacibek bû li ser helbestvanan. Pêdivîbû di helbestên klasîk ên kurdî de helbestvan li ser kêşên erûz û li ser wan 16 deryayan (Xelîlê kurê Ehmedê Ferahîdî) helbest binivînsin, her wiha xwediyê yek ji formhelbestên: xezal, qasîde, mesnewî, musemet, Çawarîn... Ji bilî giringiya serwa, taybetmendîyên din hebûn (paşserwa) ku helbestvanên kurd yên klasîk pêre pabend bûn. Bi girîngiya hûrgiliya zanista rewanbêjîyê û her sê şaxên sereke: rewanbêjî, watenasî, ciwankarî, ew jî neçar diman ku wêneyekî xweşik bixin nav naveroka xwe û ji bo gelek naverokên mîna: ol, netew, evîn, şîwen, helwest û wesif, hewc û hwd. Ji bo ku reng bide naveroka helbestvanên kurd jî bi vî awayî jêhatîbûna xwe ji bo serdemê xwe nîşan daye.

Keresteyên bercesteyî û watayên bi tiştê sekinî û bi tevger, keresteyên çêbûyî, weneyên xeyalên helbestvanî ne, di dawiye de ev keresteyên cur bi cur di hizra helbestvanî de kom dibin û wêneyên helbestên nû çêdike ,diçe ser rûpela kaxizê, ji ber vê jî em dikarin bibêjin; helbest, wênekişandina bi peyvan e. Helbestvanên klasîk girîngiyê didin wêneya ku ew dikin xeyal; bêtir wek wêneya rast, pir bi baldarî li hêmanên bingehîn ên helbestê dinerin ku ya herî

girîng ziman, formên ron û mûzîk e, her wiha sembol, nîşan e û hest û perspektîfên bê sînor ku ji wan diheriki n(Huseyîn, 2008: 95). Wêneyên ku li cem helbestvan çêbû ne, li gelêk cihên din jî hene:

1- Ax û ala û parêzerên welêt, ev keresteyên çêbûna helbestên neteweyî ne.
2- Rindî û bedewî, bejnûbal û rûyên yar û dilsozî, hemdûriya yar... keresteyên çêbûna helbestên evînî (dildarî) ne.
3- Mirin û jidayikbûn, jidestdan, dûrketin, azar û dagîrkirin, wêrankirin, keresteyên çêbûna helbestên pesin (şîwen) û pesindanê ne.
4- Xwedê û Pêxember, ayetên Qur'anê û hedîs, mizgeft, tekya, xaneqa û goristan, keresteyên çêbûna helbestên olî (dînî) ne.
5- Zûlim û nebûna maf û bieş mezinbûn, tirs û nebûna azadiyê, keresteyên çêbûna helbestên daşorîn (hecû) ne.

Di nav van hemûyan de, di helbesta klasîk a kurdî de mirov: taybetmendiya xwe, tevger, kar û çalakiyên wan keresteyên sereke yên çêbûna wêneya helbestên klasîkî dibîne.

**Dîroka Afirandina Helbesta Kurdî ya Klasîk di Ekola Helbestên Baban de, li Başûr**

Edebên milî û zarekî yên dewlemend bi helbest û pexşanê, di sedsala 18 û 19an de, li deverên: Mukriyan, Erdelan, Germiyan û bi taybet li herêma Silêmaniyê rû dabûn, ku di wê demê de diyalêkta goranî baskek li ser gelek deveran hebû. Di vê diyalêktê de edebiyat pir baş hatibû nivîsandin, ew bû bingehek ku bi taybetî di bin siya mîrektiya Baban de afirandina ronesanseke şî'rî li başûrê Kurdistanê çêbibe û ev tiştekî pir mezin bû. Ev navçeye Başûrê Kurdistanê tê wateya desthilatê û axa Baban ku li Başûrê Kurdistanê sînorê desthilata axa vê herêmê bû li van bajar û bajerokan: Li herêma Silêmaniye: Helebce, Pêncwên, Şarbajêr, Pişder, Çiwarta, Berzenc. Navçeyên Germiyan: kerkûk, çemçemal, kifrî, dûzxwrmarû, hewîce (Xezinedar, 2010:17).

Li destpêkê û berî hatina Nalî, helbesta milî û serzarê û ya tomarkirî jî hebûn, ku edebêt milî yên serzarî, dîroka wî vedigere pêşî sedsala 19yan, bi taybetî dewrana Eli Berdeşanî ku gelek helbest nivîsandine. Bi taybetî di dema fermandariya Abdulrahman Paşayê Baban de, lê helbesta milî ya tomarkirî, bi gelemperî delîl û agahî kêm li ser hene. Li devera Silêmaniyê di sedsala 18yan de û di sala 1762an de li gundê Hezarmêrd, Mele Mihemed îbn Ulhac ku mamosteyê Şêx Marfî Nodê û Mele Ebdullahê Bêtoşî bû, heft, heşt pirtûk bi erebî hebûn, bi tenê yek ji wan bi zimanê kurdî bûye, ku ew jî bi forma şî'rî û bi navê *Mehdîname* hatiye nivîsandin. Navroka wê pirtûkê, behsa cîhana îslamî dike (Xeznedar, 2010: 49). Piştê vê jî helbesta “erûz” derket holê, egerçî di pêşiyê de Nalî tak tak û li vir û li wir, dihat gotin ku helbestên klasîkî bi kurdî hatibûn nivîsandin, lê ev ne cihê baweriyê bûn. Tenê ew cihê baweriyê ye ku beytek helbestekî ya Mele Ebdullahê Bêtoşî (1747-1806) heye, ku berê Nalî bû û bi heman awayî, bi ekola şî'rî ya klasîk nivîsiye. Her wiha Mewlana Xalid (1773-1926 ) , egerçî tevî ku helbest farisî û erebî ne, lê çend heb helbestên kurdî hene. Mele Ebdulkerîm Muderis, di bergê yekem ê dîwana xwe de (Yadî Merdan) pênc helbestên Mewlana Xalid tomar kirine ku bi diyalêkta goranî ne û yek jî bi kurmanca jêrî (başûr) ye (Mîna, 2007: 31). Lê wekî me got, ew hewlên kesekî ne û ne li asta ekola şî'rî de ne.

Bêguman ronesansa helbestên klasîk ên kurdî, li başûrê Kurdistanê di bin destê Mîrektiya Baban de, bi taybet Nalî û Salim û Kurdî, bû. Ji ber vê yekê: ev ekol jî, bi ekola helbasta klasîk a Baban bi nav û deng e, bi taybetî Nalî, ku hem wekî mamoste û hem jî wekî temen ji yên din mezintir bû, li bêştir bû. Reç û rêrewên nivîsîna helbestê di kurmanciya başûr de guhert, pişt re tevî helbestvanên başûr û gelek cihên din jî li pey wan çûn (Mîne,2007: 235). Edeb û zanista xwendinê ya ekolê, Birîtî bû di şerî'etê îslamê de bû û her wiha nimûneya ayetên Quranê û gotinên pexember (s) bû. Hafiz , Se'dî û Mewlana Celaledîn ... Ev jî bi zimanê erebî û farsî bûn, û klasîkên kurdî bûn, helbestvanên kurdîya klasîk, gelekan ji edebiyata van herdu miletan bi taybetî li medreseyan mifa wergirtin. Her zemana behsa dîroka helbestvanên kurd ên klasîk bê kirin û divê xwendina hewcire jî bên behiskirin. Helbestvanên klasîk ên kurd, li medreseyan dixwendin, mamoste Alaedîn Secadî di *Dîroka Edebî ya Kurdî* de û di mijara jîyana helbestvan de (Adeb 1859-1912) li ser du cureyên xwendina medreseyan dipeyive ku ew jî di bingeha xwe de helbestvanên medreseyan in: "Wê demê xwendin du curê bû; bi ya ewil degotin Mela, ev zêdetir mijûlê zanistên olî bûne, ku aşinayetiya wan jî hebû digel zanistên erebî yên din wekî: belax, mentîq û usûl, felekîyat, neh û serf, tefsîr, hedîs û hwd. Ew bi navê xwe û navûdengê xwe wek xwendekar û miroveên jîr derketin holê, ku di hucr yên mizgeftê de û di nav odeyeke pîs û dûkel de jîyan didomandin, lê ev jî zana, edîb û helbestvanên pir baş û bi navûdeng bûn, alemê tijî bi nûr û asmanê helbesta kurdî ya klasîk, heya destpêka sedsala bîstan, zadeya van hucran bûn. Di van deman de hemû mîr û began dixwestin zarokên xwe bişînin van huceran û bibin zana û huqûqnasên navdar û jêhatî. Ji ber ku mezûnbûna di va hucran de, wek hakimên wê demê bû, her tim ew kirin hakimên şer û ewlehiyê û her tişt...

Şaxekî din jî hebûn, bo wan digotin Mirza, ku bi girîngî farisî dixwendin û bi karê rêxistinkirina kaxez û bi xweşiknivîsandin dikirin, dema ku ji bo bêtir agahdariyê erebî dixwendin, ew ne cihê medreseyan bûn, lê li nêzîkî bilengazan û li mala beg û olyaqê mafê nivîsandina kaxezan û her xebateke fermî ji wan re hatiye dayîn. Hemî kitêb û nivîs li cem wan hebûn û her tim kaxez û heriye di malê de hebûn, bi zarokên wan axa û dewlemendan dersa edîb û bextewar re digotin, wekî mamosteyan bûn ji bo wan zarokan (Secadî,1952:401). Ev wêneyek ji dîroka xwendina gelê kurd bû, ku pêdivîbû bê ber çavan, her wiha dîroka peydabûna helbesta klasîk a kurd li Başûrê Kurdistanê bû. Piştî vê dîrokê, hin helbestvanên din li pey helbestvanên klasîk ên ekola Baban ya helbestê ketin û heta dema ji nû ve vehûnandina kurdî-kurdî û piştî wê serdemê, bi rengekî mezin li başûr helbest bi vî rengî ji nû ve nivîsandine.

**Helbesta Kurdî ya Klasîk di Ekola Baban de**

Dîroka gelek salan a wêjeya kurdî ya serbilind, berhemeke bilind û hêja û tijî resenîteya xweşik û pirreng ji destpêka xwe heta serdema nûkirina wêjeya helbestî xwe di dîrokê de bi cih kiriye. wêjeya kurdî, hewldanên ji dil, hest û bêewlebûna di hundirê helbestvanan de bi sedan salan, ligel wêjeya nivîskî ya folklorî xebateke mezin li ser berhema wêjeya klasîk kiriye" (Xezinedar, 2010: 194) Li gorî vê yekê guhertinek hat û rengê di rû û naveroka helbestên klasîk ên kurdî de berdewam kir.

Form û naveroka helbestan, wek du rûyê pere ye, wisa di pênaseyên helbestê de xuya dike. Helbest tenê hêmanekê tevlîhev nake, helbest ne mîna avê ye, ji du hêmanên hîdrojenê pêk naye, lê helbest tevlîheviya çend nîjadan e û ji çend regezan pêk hatiye. Bi van nîjadan re xweza, bedewî û tevgera helbestan derdikeve holê û bi van pêkhateyan re xwendevan, teyrê baskan ber bi cîhana bedewî û xeyala hest û zîhnîyeta helbestvan ve xeyal dike, lê her yek ji wan erkekî şî'rî li ser heye. Rûyê helbestê beşeke sereke ya helbestê ye û ew jî perçeyeke wê ye ya ku bi rû ve girêdayî ye, ji çend zayendên wekî mûzîkê: rîtm, kîş û serwayê, hunera rewanbêjiyê, kurtî û dirêjahiya peyvan. Serwa û awaza dengî ji dûmahiya peyvan pêk tê, ku bi beşeke girîng a helbestê hatiye nivîsîn: Bi rengekî ku ne girîng e rûyê helbestê netemam be. Helbestvanê afirîner, weke ku di tuxmê an pêkhateyên din ên damezîrandî yên helbestê de desthilatiya xwe îsbat dike, dikare destê xwe di kêş û serwayê de îsbat bike, ku her du beşên sereke yên rûyê helbestê ne (Kurdo, 2006: 91). Tevî ku naverok jî raman, hest, hêrs û xeyal e ku li ser rû hatiye dîzaynkirin, an; endamên laşê helbestê, yên ku di çermê xwe de cihê xwe girtin, an jî libên hinarê yên parçeyî bi rengekî xweşik, bi rîz hatine stacîkirin (Bêdar, 2013: 24). Ji ber vê yekê, di vê rewşê de em dibînin ku her du form û naveroka helbestê bi hev re girêdayî ne û yek ji wan bêyî hev çênabe. Her helbestek bi xwe her ji du form, naverokan têkiliyeke xurt di navbera wan de heye ku bi heman raman, hest û ramanan re û bîr û boçûna rû ye ku di naverokê de hene û naverok jî bi heman awayî bi ruxsar, di forma helbestê de çerm digirin. Ew çermê ku laşê helbestê di hemû beşên xwe de hiştiye.

**Bîblografiya Helbesta Klasîk a Ekola Baban**

Ev helbestvanên klasîk ên li başûr ku di bin destê ekola Baban (Nalî) de helbest nivîsandine, gelek in, ku li serdema Nalî ve dest pê dike heta îro. Li vir û li wir û her der şûnpêyek heye, ji jêr ve, di bîblografiyê de, di sê qonaxan de, em navê wan şa'îran eşkere dikin ku li başûr bi klasîk nivîsandine, digel şa'îrên din ên derdora Mîrê Baban jî ku bi heman form helbest nivîsandine.

Me ew bi rengekî rêz kirine, ku qonaxa yekem damezrênerên ekolê ne û qonaxa duyem jî ew in ku di serdema Nalî de ne û heta çareka yekem a sedsala 20ê bi rengekî klasîk nivîskar bûn û qonaxa sêyem jî ew helbestvan in yên ku piştî Şerê Cîhanê heta çareka dawîya sedsala 20ê, digel nûvebûna helbestên kurdî, an jî ewên helbestvan in ku egerçî digel nûvebûna helbesta kurdî bûn û bi forma nû helbest dinivîsandin, lê bi forma klasîkî jî li gor ekolên şi'rî yên Baban jî şi'îr nivîsandine. Herwiha em wan helbestvanan jî dinivîsînin ku ketine bin destê Mîrê Baban ê kevin û başûrê niha. Bi taybetî li deverên Silêmaniye, Koye, Helepçe, Hewlêr, Kerkûk, Kelar, Kifirî, Xaneqîn. Her wiha me bi navê dawî, sala jidayikbûn û mirina wan ligel paşnavê şa'îran daye.

| Koma Yekem: Damezrînerên Helbestên Klasîk ên Kurdî (Ekola BABAN) | | | |
|---|---|---|---|
| **Z** | **Navê Şair** | **Sal/ Serdem** | **Hinek Agahî derbarê Biyografyaya Helbestan de** |
| 1 | NALÎ | 1800- 1877 | Xidir kurê Ehmed Şaweys e. l<br>Ji hoza Alî Begî Mîkaîl, 'Eşîreta Caf e, li gundê Xakûxom, li Şarezor ji dayîk bûye, sala ji dayîkbûn û mirina wî bi dirustî nayê zanîn, Nalî digel Salim û |

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | | Kurdî, wekî damezrênerên helbesta kurdî ya klasîk (Medreseya Baban) tên naskirin, bi taybetî Nali. (Mela ‘Ebdulkerîm û Fatih, 1978: 33-35) |
| 2 | SALIM | 1805-1869 | Ebdulrehman Beg kurê Mhemed Begî Qerecehenmî kurê Ehmed Begî Sahêbqran e<br>Ji binemala Sahêbqiran e, jidayîk bûn û mirina wî jî, li Suleymanyê bûye, li goristana Saîwan hate veşartin, digel Nalî û Kurdî wekî damezrênerên helbesta kurdî ya klasîk (Medreseya Baban) tên naskirin. (Mela ‘Ebdulkerîm, Fatîh û Mehemed, 2015: m-n) |
| 3 | KURDÎ | 1812-1850 | Mistefî Begî kurê Mehmud Begî kurê Ehmed Begê Sahêbqiran e<br>Kurdi, wekî Salim ji binemala Sahêbqiran e û pismamê Salim e, ji dayikbûn û mirina wî jî, li Suleymaniyê bûye, li goristana Saîwan hate veşartin, digel Nalî û Salim wekî damezrênerên helbesta kurdî ya kilasik (Mediresey Baban) tên naskirin. (hemebor, 2010: 15-28) |

| **Koma Duyem: Şairên Li Dor Ekola Baban Peyrewîkarên Helbesta Kurdî Ya Klasîk (Ekola BABAN)** | | | |
|---|---|---|---|
| **Z** | **Navê Şair** | **Sal/ Serdem** | **Hinek Agahî derbarê Biyografyaya-HELBESTVAN** |
| 1 | KEYFÎ | 1814-1883 | Keyfî, navî wî Fethullah e, li Ciwanro û li Başûr jiyaye.<br>Bi navê Keyfî Ciwanroyî bi nav û deng e, li Ciwanro ji dayîk bûye û li bin desthelatdariya Baban jiyana xwe domandiye, hin kesên mîna Hacî Qadrê Koyî dibêjin ew li devera Şarezorê hatiye dinyayê, bi giştî jiyana wî li Koyê bû û li Stenbolê jî wefat kiriye. Helbesta Keyfî bi temami li ser rêbazên klasîkî ye. (Xezinedar, 2010: 39-41) |
| 2 | HACÎ QADIRÎ KOYÎ | 1816-1897 | Hacî Qadir kurî Mela Ehmedî kurê Mela Salihî kurî Mela Ehmedî Gewrey e.<br>Hacî li Koye, li gundekî wê derê yê bi navê Gor Qereç ji dayîk bûye, xwendina wî li hewcire bûye, Hacî wekî Nalî li Stenbolê wefat kiriye, her weha helbestên wî hemû klasîk e. (Kelhur, 2008 : 65-68) |
| 3 | MEHWÎ | 1831-1906 | Mihemed kurî Şêx Osmanî Balxî ye.<br>Mehwî li navçeya Mawet, ser bi herêma Suleymaniyê ji dayîk bûye, ji bilî Mehwî wekî Meşwî jî tê naskirin, li gelek cihên li Tirkiye, Îran û Îraqê geryaye. Mehwî udan xaneqayekî mezin bûye, helbestên wî bi tevahî klasîk in û yek ji wan helbestvanên klasîk e ku bi berfirehî 'erûza erebî bi kar anîye, piştî mirina Mehwî her di nav xaneqayê xwe de hatiye veşartin. (Mela 'Ebdalkerîm û Mihemed,1378 : 7-9) |
| 4 | ŞÊX REZA | 1837-1910 | Şêx Reza kurê Şêx Ebdulrehman kurî Şêx Ehmed |

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | | Talebanî kurî Mela Mehmudî Zengene ye. Li gundê Qirix, nêzî Şaroçkeyê (Çemçemal) û navçeya Baziyan, ji dayîk bûye, ji bilî Şêx Reza û Reza, wekî naznaw hin caran Lami' jî bi kar aniye, heytê wî pir zehmet bûye, ji ber vê jî Şêx Reza bûye mezintirîn helbestvanê helbesta hecûyê (hicîw) di nav klasîka kurdî de, helbestên Şêx Reza bi gelemperî klasîk in, piştî nexweş dikeve, li Bexdad di nav gorstana Şêx ‘Ebdulqadirê Geylanî de hate veşartin. (Mistefa, 2010 : 11-12) |
| 5 | EBDULLAYÎ CELÎZADE | 1834-1908 | Ebdulla kurê Mela Esedî Celîzade<br>Mela Ebdullah li Koye çêbûye, gelêk helbestên bi zimênê kurdî, farisî û erebî nivîsandine, piştî 76 salan temen, li Koye koça dawîyê kiriye. (Sefîzade,2008 : 655) |
| 6 | EXTER | 1839-1888 | Emîn Axayê kurê Bekir Axayê kurê Mihemed Axayê Hewêzî<br>Exter, bi manaya stêrk tê, li gerekî Befirqendî, li herêma Kiye ji dayîk bûye, xwendina wî li Huire bûye, axa bû lê feqîr bû, li ser rê û rêbazên klasîk helbest nivîsandiye, dawiya jiyan û mirina wî li Koye bûye û li goristana Arebiyan hate veşartin. (Xezinedar, 2010: 57-58) |
| 7 | SANÎ | 000-1906 | Kak Ebdulla kurê Kak Elî kurê Kak Ebdullay kurê Kak Mistefaye Bawkî (Safî) Şa'îr e.<br>Naznavê wî Sanî bûye, ji dayîkbûna wî ne dîyar e, emma di derdora sedsala nozdehê de çêbûye, bi gelemperî helbestên Sanî klasîk in, piştî mirina xwe li goristana Binemale, li gundê Hîran hate veşartin. (Xezinedar, 2010: 67) |
| 8 | NÎHANÎ | 1865-1934 | Şêx Mihyedîn kurê Şêx Ebdulkerîm kurê Şêx Ehmed e.<br>Nîhanî li Koye ji dayîk bûye û mirina wî li Helece bûye, xwendina wî li hucire de bûye, helbesta wî klasîk in, piştî derbederkirinê, ew berê xwe dide deşta Erbîlê û li Helece û di nav goristana Helece de hate veşartin. (Xezinedar, 2010 : 73-74) |
| 9 | MENFÎ | 000-1921 | Mela Resul kurê Mela Mehmudî Bêtuşîyî ye.<br>Jidayîkbûna Menfî ne dîyar e, emma li herêma Koye ji dayîk bûye, ji binemala Bêtewş e, gelek şiyar û xurt bûye, hemû helbestên menfî klasîk in û wisa jî li Koye wefat kiriye û li wê jî bi xak spartine. (Xezinedar, 2010: 79) |
| 10 | FAYEQ | 1806-1889 | Osman kurê Hacî Îsmaîl kurê Mela Ehmed kurê Mela Fazîl<br>Helbestvan li herêma Suleymanê bi dinyayê hatiye, Fayeq di nav hucire û mizgeftê de xwendina xwe qedandiye, ji bilî Fayeq wekî naznav Hezîn jî hatîye |

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | | gotin, helbestên Fayeq minakeke pir baş a helbesta kurdî ya klasîk a başûrê Kurdistanê ye, mirina wî li Suleymanîyê bûye û di nav Xaneqayê Hacî Mela Elî hate veşartin. (Xezinedar, 2010: 103-104) |
| 11 | HERÎQ | 1856-1909 | Salihê kurê Mela Nesrullah e<br>Yek ji helbestvanên mezin ên helbesta kurdiya klasîk a nîvê duyem ê sedsala nozdeh e û destpêka sedsala bîstê ye, Herîq li gundê Zêwye yê navçeye Surdaşê, li suleymanîyê ji dayîk bûye, dûmahiya jiyana xwe li Mihabadê domandiye û mirina wî li wir bûye. Li goristana Mela Camî, hatiye veşartin lê mixabin niha cihê wî (gorê wî) nemaye. (Enîsî, 1368 : 1-5) |
| 12 | AHÎ | 1845-1906 | Salih Kurê Ehmed e.<br>Ahî, ji dayîkbûn û mirina wî li Suleymanîyê bûye, mîna helbestvanên dever û derdorên xwe , xwendina wî jî li hucire bûye, helbestvanekî kêm nasraw e, helbestên wî jî kêm in, amma hemû helbestên Ahî klasîk in. (Xezinedar, 2010: 627) |
| 13 | XAKÎ | 1845-1906 | Navê wî Ehmed e.<br>Ji gundê Ehmedbirind e, li herêma helebce ji dayîk bûye, ji bo xwendinê li gelek deveran geriyaye, piraniyê heyata wî bi Melayetiyê derbas bûye li Suleymanîyê, wisa jî mirina wî her li Suleymanîye bûye. (Xezinedar, 2010: 631) |
| 14 | MELA HEMDÛNÎ KWÊR | 1861-1917 | Hemdûn kurê Mela Ehmedî Şarbajêrî ye.<br>Li Suleymanîyê ji dayîk bûye, hin kes di vê baweriyê de bûn ku Hemdûn bi korî ji dayîk bûye, hafiz ê_Quranê bûye, gelek helbestên wî yên rind hnye, li 'umrê 85 salî li Helebce koça dawî dike. (sefî zade, 2008: 688-689) |
| 15 | SEYÎD EHMEDÎ NEQÎB | 1863-1910 | Ehmed kurê Şêx Mehmud kurê Şêx Marif kurê Şêx Hesenî Gilezerde ye.<br>Seyîd Ehmed, bi naznavê Neqîb hin caran jî wekî Seyîd, bidinyahatinê wî li Suleymaniyê bûye, li hucreya feqeyan hînî helbestê bûye, bi sedema nexweşîyê ji hecê vegerîyayê û çûye ber dilovanîya Xwedê û li goristana Beqî' bi xak sperde bûye. (Sefîzade, 2008: 692-693) |
| 16 | TAHÎR BEGÎ CAF | 1878-1918 | Tahîr kurê Osman Paşay kurê Mihemed Paşay kurê Keyxusrew Begî Caf<br>Tahîr Begî Caf, di nav koma xelkê de bi Tahîr Beg bi nav û deng bû, ji dayîkbûna Tahîr li herêma Helebce bûye, temenê wî ne dirêj bûye û bi sedema nexweşîyê li Suleymanîyê koça dawî kiriye û termê wî zivirandine Helebce û li goristana 'Ebabeylê hate veşartin. Tahîr Beg, di nav dîwana xwe de, bi tenê du helbest bi forma sîlabî hene, yên dî helbestên bi forma klasîk in û me jî ew wek helbestvanekî klasîk |

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | | hesibandiye. (Xezinedar,2010 : 597-598) |
| 17 | MÎZRA XEFÛR | 1870-1938 | Xefûr kurê Hacî Omer kurê Hacî Ebas E. Li gerekî Serşeqam, li herêma Suleymanîyê ji dayîk bûye, naznavê wî bi Mirza û Mirza Xefûr hatiye, di nav dewleta Osmanî de 'esker bûye, helbestên wî hemû klasîk in, mirina wî li Suleymanê bûye, niha gora wî li Girdî Seywan e. (Xezinedar, 2010 : 176-177) |
| 18 | HEMDÎ | 1878-1936 | Ehmed kurê Fetah Beg kurê Hacî Îbrahîm Beg kurê Mehmud Begê Sahêbqiran E-e. Hemdî mîna Salim û Kurdî, ji 'eşîreta Sahêbqiran e, li Suleymanîyê bi dinyayê hatiye, bi destûra klasîk helbest nivîsandiye û gelek helbestên wî yên payebilind hene, di serdema Şêx Mehmudê Hefîd de, wezîrê gumrikê bûye, Hemdî bi sedema rawestana dil wefat kirîye û li herêma Suleymanîyê, li goristana Girdî Seywan hate veşartin. (Mewlûd, 2013 : 13-15) |
| 19 | SAFÎ | 1873-1942 | Kak Mistefa kurê Kak Ebdulla kurê Kak Elî kurê Kak Mistefay Hîranî ye. Kûrê Sanîyê helbestvan e, Safî ji gundê Hîranê ye, li herêma Koye ji dayîk bûye, xwendina wî li hucre û mizgeftê bûye, hemû helbestên Safî mîna babê xwe, li ser rê û rêbazên klasîk bûye, koça dawîyê ya wî her li Hîranê bûye. (Xezinedar, 2010 : 337-339) |
| 20 | SABÎRÎ | 1882-1944 | Necmedîn kurê Şêx Ebdulrehman kurê Şêx Mehmûd Qutbî Şorîce ye. Sabîrî, helbetvanekî Germiyanî ye, li gundê Şorîce, navçeya Qerehesen, li Kerkûkê ji dayîk bûye, bi awayê klasîk helbesta xwe nivîsandiye, heyata wî pir zehmet bûye, ji ber nebûnîyê rençberî kiriye, niha gora wî li goristana gundê Şorice ye. (Xezinedar, 2010: 408-409) |
| 21 | FUAD | 1892-1925 | Tahîr kurê Şêx Ebdulletîf e. Mina helbestvan Sabirî; Fuad jî li devera Germiyanê û li herêma Kerkûkê ji dayîk bûye, helbestên Fuad tev klasîk in, herweha yek ji wan helbestvanan e ku beşdarî kiriye li bikaranîna peyvên kurdîya petî di nav helbestê de, sedema mirina wî nayê zanîn. (Xezinedar, 2010 : 443-444) |
| 22 | EHMED MUXTAR CAF | 1897-1935 | Ehmed Muxtar kurê Wesman Paşa kurê Mihemed Paşa kurê Keyxusrew Begî Caf e, birayê Tahîr Begê Caf e. Ehmedê Muxtar, birayê helbestvan Tahîr Beg e, ji 'eşîreta mezin Caf in, ji dayîkbûna Ehmedê Muxtar li Helebce bûye, serdema jiyana helbestî ya wî di nav her du babetên 'erûzî û helbestên diyalêkta goran de maye, emma tev helbestên Ehmedê Muxtar bo forma klasîk bûye, mirina wî bi karesateke diltezî bûye û |

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | | niha li cem Tahîr beg, li goristana 'Ebabeylê ye. (Secadî,1952 : 501-503) |
| 23 | MÎHRÎ | 1903-1942 | Mihemed Şerîf kurê Mela Bîrahîm kurê Mela Ebdulfetah e.<br>Mîhrî, bab û bapîrên wî olîyê mizgeftê bûne, jidayîk bûna wî li herêma Erbîlê bûye, helbestên Mîhrî kêm in, lê pir bi şewq û bedew in, yek ji helbestvanên klasîk e, pîştî jiyaneke kurt li herêma Erbîlê koça dawîyê dike û li goristana mezin a bajêrê Erbîlê hate veşartin. (Xezinedar, 2010 : 549-550) |
| 24 | ŞAHO | 1882-1971 | Hesen kurê Mela Ebdulqadir kurê Mela Ebdulrehman e.<br>Şaho li herêma Hewraman û li şaredêya Biyare ji dayîk bûye, ji bilî Şaho, di pêşî de naznavê Şayeq û wekî Mela Hesen jî nadar e, bi forma klasîk helbesta xwe nivîsandiye, li gelek cihan gerîyaye, piştre ziviryayê Helebce, koça dawîya Şaho li Biyare bûye. (Xezinedar, 2010 : 161-162) |
| 25 | ŞÊX MEHMûD | 1884-1956 | Mehmûd kurê Şêx Seîd kurê Şêx Mihemed Biçkol kurê Kak Ehmed kurê Şêx Marifî Node ye.<br>Melîkê kurdistan Şêx Mehmudê Xefîd li Suleymanîyê bi dinyayê hatîye, helbestên Şêx Mehmûd ne zor in, lê tev helbestên wî bi forma klasîk hatine nivîsandin, gelek xebetên sîyasî yên wî hene, di bin destê hikumetdariya wî de helbesta kurdî gelek bi pêş ket, bi sedema nexweşîyê li Bexdad koça dawîyê kiriye û termê wî zivirandine Suleymaniyê, di nav mizgefta mezin a Suleymanîyê ye. (Xezinedar, 2010 : 187-188) |
| 26 | ÇIRUSTANÎ | 1890-1963 | Mihemed kurê Mela Ebdulrehîm kurê Omer ji Neviyên Pîr Xidirî Şaho ye.<br>Cirûstanî, li gundê Ablaxê, li Suleymanîyê bi dinya hatiye, tu helbestekî sîlabî bi kar neaniye û tev helbestên wî klasîk in, bi sedema nexweşîyê li Suleymanîyê miriye. (Sefîzade, 2010 : 761) |
| 27 | NASÎH | 1898-1986 | Nasîh kurê Ebdullay kurê Sebxetullay Heyderî ye.<br>Jidayîkbûna wî li Erbîlê bûye û bi navê xwe yê rastî Nasîh, helbest nivîsandîye, xwendina wî li hucreyê bûye û mirina wî her li Erbîlê bûye. (Xezinedar, 2010: 505) |
| 28 | REMZÎ | 1902-1976 | Mihemed Marif kurê Mela Resul kurê Ehmed e.<br>Remzî li Suleymanîyê ji dayîk bûye, di pênc saliyê de çûye ber xwendinê û li gelek cihên Kurdsitan û Iraq geriyaye, bi forma klasîk helbesta xwe nivîsandiye, bi sedema nexweşîyê koça dawî kiriye û li goristana Seywan bi xak sparde bûye. (Xezinedar, 2010 : 541-542) |
| 29 | DEŞTÎ | 1909-1957 | Xidir kurê Ehmed kurê Elî ji Binemala Nanekelî ye.<br>Deştî, ji 'eşîreta Nanekelî ye, li gundê Melakaxe, |

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | | binara çiyayê Qereçux ji dayîk bûye, xwendina wî li hucreyê bûye û bi destûra klasîk helbesta xwe nivîsandîye. Ew bi sedema nexweşîya dil koça dawîyê kiriye û li gundî Xerabediraw û li goristana vî gundê bi xak sparde bûye. (Deştî, 2001 : 8-9) |
| 30 | MUXLÎS | 1910-1985 | Xelîl kurê Resul kurê Mistefa ye. Helbestvan Deştî li hewarê gundê Şorezertke Deştî Kenînaweyê Erbîl ji dayîk bûye. 'Ewil naznavê wî Wafî bûye, piştî demekê naznavê Muxlîs bi xwe re hilbijartîye, tev helbesên wî bi forma klasîk hatine nivîsandin, bi sedema nexweşîyê koça dawî kiriye û li goristana gundê Pîradawid bi xak sparde bûye. (Xezinedar, 2010 : 183-184) |
| 31 | HERDÎ | 1922-000 | Ehmed kurê Hesen Beg kurê Ezîz Beg e. Herdî li Suleymanîyê ji dayîk bûye, xwendina wî di medreseyên Suleymanîyê de bûye, kesekî rewşinbîr bûye, Herdî jî li ser rê û rêbazên klasîk helbesta xwe nivîsandiye. (herdî,1984 : 95) |
| 32 | HESÎB QEREDAXÎ | 1929-1997 | Hesîb kurê Elî kurê Ebdulrehman e. Li gundê Soley Çirçeqilayê, navçeya Qeredax bi dinyayê hatiye, helbesta wî jî klasîke û li gelêk cihên Kurdistan û Iraq geriyaye, Hesîb Qeredaxî li Suleymanîyê koça dawî kiriye. (Xezinedar, 2010 : 663-664) |
| 33 | BÊBEŞ | 1932-1998 | Mesûd kurê Mela Ebdullay Şenexî ye. Li Erbîlê ji dayîk bûye, dengê Bêbeş pir xweş bûye ji bo xwendina Quranê, olî bûye û pêrewîyên şert û mercên helbestên klasîk kiriye, mirina wî li Erbîlê bûye. (Xezinedar, 2010 : 675-676) |

- Li jêrîn ji bo koma sêyem em vegeriyan e her yek ji van çavkaniyan: *Dîroka Wêjeyê* bi nivîsandina **Elaeddîn Secadî**, *Encûmenê Edîban* bi nivîsandina **Emîn Feyzî Beg**, her wiha bergên 3, 4, 5, 6 û 7an ên *Dîroka Wêjeyê Kurdî* di nivîsandina **Marif xezinedar**, her wiha *Şî'r û Edebiyata Kurdî* di nivîsandina **Refîq Helmî**. Ji bo bêtir lênihêrîn û belavbûna navan em vegeriyan beşek ji dîwana helbestvanan, her wiha di tabloya jêrîn de, tenê nasnav û sala jidayîkbûn û mirinê û her wiha nivîsandina navê tevahiya şaîran nivîsandî ye. Ji bo me ne pêwîste em jîyana helbestvanên vê grûbê nîşan bidin, ji ber vê yekê me tenê navên şaîran û paşnavên wan eşkere kirine.

| **Koma sêyem, ew helbestvan in ku egerçî digel nûvebûna helbestê kurdî bûn û bi forma nû helbest nivîsandine, lê bi forma klasîkî jî û li gor ekolên şî'ra Baban jî şi'îr nivîsandine.** | | | |
|---|---|---|---|
| Z | **Navê Şair** | **Sal/ Serdem** | **Li vir ji bo koma Sêyê, hewcê nake jîyana helbestvanan derbixin holê mîna koma yek du, me tenê nav û paşnavên wan derxistine.** |
| 1 | EMÎN FEYZÎ BEG | 1865-1928 | Mihemed Emîn kurê Derwêş Ebdulqadir e. |

| | | | |
|---|---|---|---|
| 2 | PÎREMÊRD | 1867-1950 | Tofîq kurê Mehmud Axay kurê Hemze Axay Mesrif e. |
| 3 | ZÊWER | 1875-1948 | Ebdullay kurê Mihemed Efendî kurê Mela Resûl e. |
| 4 | BÊXUD | 1879-1956 | Mehmud Kurê Mela Emîn Muftî kurê Mela Ehmedî Çawmar e. |
| 5 | MELA MHEMEDÎ KOYÎ | 1876-1943 | Mihemed kurê Mela Ebdulla kurê Mela Esedî Celîzade ye. |
| 6 | BÊKES | 1905-1948 | Faye kurê Ebdulla Beg kurê Kake Hemey Elyase Qoce ye. |
| 7 | DILDAR | 1918-1948 | Yonis kurê Mela Reuuf kurê Mela Mehmûd Efendî kurê Mela Seîdî Xadîmulsecad e. |
| 8 | BABE | 1880-1967 | Ebdulrehman kurê Ehmed Beg Gurî Xalîd Beg kurê Silêman Paşay Baban e. |
| 9 | MUFTÎ PÊNCWÊNÎ | 1881-1952 | Ebdullay kurê Mela Kerîm e |
| 10 | KEMALÎ | 1886-1974 | Elî Kemal kurê Bapîr Axay Simayl Ozeyrî ye. |
| 11 | EHMEDÎ NALBEND | 1891-1963 | Ehmed kurê Emîn Badînan e. |
| 12 | SELAM | 1892-1959 | Selam kurê Şîx Ehmed kurê Ebdulkerîm e. |
| 13 | ESÎRÎ | 1895-1962 | Ebdulxaliq kurê Seyd Husên Efendî ye |
| 14 | XADÎM | 1895-1971 | Ebdulla kurê Mhemed Mewlûd e. |
| 15 | ŞÊX NÛRÎ ŞÊX SALIH | 1896-1958 | Nûrî Kurê Şêx Salih kurê Şêx Xenî kurê Şêx Ebdulqadir e. |
| 16 | 'Urfî | 1896-1961 | Arif kurê Şêx Mehmud kurê Mela Nesrullay Qazî ye. |
| 17 | KANÎ | 1897-1957 | Ebdulcebar kurê Mela Ebdulrehman kurê Teha kurê Ebdullay Doxremeçî ye. |
| 18 | REFÎQ HÎLMÎ | 1898-1960 | Refîq kurê Salih kurê Ebdulla ye. |
| 19 | QANÎ' | 1898-1965 | Mihemed kurê Şêx Ebdulqadir kurê Şêx Seîdî Dolaşî ye |
| 20 | ES'ED MEHUY | 1898-1976 | Esed kurê Mela Xalîd kurê Mihemedî kurê Mehuy Şaîr e. |
| 21 | BÊDAR | 1894-1949 | Şêx Baba Elî kurê Şêx Ebdullay kurê Şêx Elî kurê Şêx Letîfî kurê Şêx Selîmî (Hencîran) ye. |
| 22 | WYSALÎ | 1902-1973 | Mihemed kurê Şêx Ehmed kurê Şêx Teha Merdoxî ye. |
| 23 | GORAN | 1904-1962 | Ebdulla kurê Silêman Beg kurê Ebdulla Beg e. |
| 24 | LUTFÎ | 1905-1989 | Lutfî kurê Şêx Reza Şêtey kurê Şêx Marfeqûle ye. |
| 25 | ŞAKELÎ | 1907-1982 | Şêx Ehmed kurê Şêx Mihemedî kurê Şêx Se'îdî kurê Şêx Şehabedîn kurê Şêx Elî kurê Şêx Îbrahîmî Berzince ye. |
| 26 | BEXTIYAR | 1908-1952 | Fayeq kurê Mela Ebdullay Zêwerî Şaîr e. |
| 27 | ARÎ | 1910-1968 | Necmedîn kurê Mela Resulî Dêlêje ye. |
| 28 | MÎNE CAF | 1911-1965 | Mîne Caf kurê Kerîm Begî kurê Fetah Begî kurê Heme Paşay Gewrî Caf e. |
| 29 | FANÎ | 1910-1973 | Memend kurê Resûl Axa ye. |
| 30 | EXOL | 1911-1988 | Ehmed kurê Derwêş kurê Ebdulla ye. |
| 31 | 'EWNÎ | 1914-1992 | Osman kurê Hebîb kurê Ebdulla ye. |
| 32 | KARDOXÎ | 1916-1982 | Mihemed Emîn kurê Kake Şêx kurê Şêx Mihemed |

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | | (Behaedîn) kurê Şêx Osmanî Tewêle ye. |
| 33 | ŞÊX LETÎF | 1917-1972 | Letîf kurê Şêx Mehmud kurê Şîx Se'îd e. |
| 34 | CAHÎD | 1918-1991 | Burhan kurê Mihemed kurê Ebdulrehman Doxirmeçî ye. |
| 35 | MEDHOŞ | 1919-1994 | Mihemed Elî kurê Mihemed Salih kurê Mihemed Qurbanî ye. |
| 36 | DILZAR | 1920-000 | Ehmed kurê Mistefa kurê Mihemed Axay Hewêzî ye. |
| 37 | MARIF BERZNCÎ | 1921-1963 | Marif kurê Şêx Ebdulkerîm kurê Şêx Husên Berzincî ye. |
| 38 | DÎLAN | 1927-1990 | Mihemed Salih kurê Mela Ehmed Dîlan kurê Mela Salih kurê Mela Qadrî Şewxwên e. |
| 39 | KAKEY FELLAH | 1928-1990 | Mihemed kurê Mihemedemîn kurê Qadir e. |
| 40 | ELÎ FETAH DIZEYÎ | 1928-1992 | Elî kurê Fetah kurê Hewêz kurê Silêman e. |
| 41 | ACIZ | 1929-1967 | Ebdulla kurê Mela Mihemedî Husênî Berzincî ye. |

**Bi vê yekê re, ligel ku ji devereke din ya li derdora Baban û başûr in, gelek deverên bi nav kirî yên wekî: Sîna, Sabilax, Merîwan, Axa Mukiryan û Hewramana Texit û Bexdad, helbestvanan ji bo xiwendinê berê xwe dane hucreya Baban, ketine bin bandora helbesta klasîkî ya Baban û bi forma vê ekolê helbest nivîsandin e:**

| Z | Navê Şair | Sal/ Serdem | Nav û Paşnavên Helbestvanan |
|---|---|---|---|
| 1 | WEFAYÎ | 1844-1902 | Ebdulrehîm kurê Mela Xefûr kurê Mela Nesrula ye. |
| 2 | EDEB | 1859-1916 | Ebdulla Beg kurê Ehmed Beg kurê Rostem Beg kurê Babe Omerî kurê Seyfedîn e. |
| 3 | EDÎB | 1874-1932 | Resul kurê Mela Sadîq kurê Ebdulrehman Zendî ye. |
| 4 | NARÎ | 1874-1944 | Mihemed kurê Mela Ehmed kurê Mela Mihemed kurê Mela Ebdulrehman e. |
| 5 | ŞUKRÎ FEZLÎ (HEMMÎ) | 1882-1926 | Şukrî kurê Mehmud Axay kurê Ehmed Axa ye. |
| 6 | HÊMIN | 1921-1986 | Mihemed Emîn kurê Seyd Hesen Şêxelîslamî Mukrî ye. |
| 7 | HÊDÎ | 1927-000 | Xalîd kurê Hemed Axay Mukrî ye.. |

**Encam**

Damezrênerên Ekola klasîk a Kurdî ya Baban li başûr, berî ku dest bi nivîsandina Kurdî ya klasîk bikin, xudan nivîsîna bilind bûne, ev serdestî û bilindî jî ji hucre û diyalêkta goran û Erdelan wergirtine.

Nalî, Salim û Kurdî, damezirênerên helbesta kurdîya klasîk in li başûr ku ev ekola şi'rî bi ekola şi'rî ya Baban û ekola şi'rî ya Nalî jî tê naskirin.

Mîrên Baban û berpirsên vî mîrî heta îro li başûr her tim di nivîsandin û azadiyê de piştgirî didan helestvan û rewşenbîran. Ev jî bû sebebê sereke yê serhildan (derketin) û pêşketina nivîsandina bi zimanê kurdî û jenereya helbestê di vê dibistanê de. Bi vê

piştevanîyê jî gelek helbestvanên klasîk ji nifşê yekem (Nalî, Salim, Kurdî) heta nifşê duyem û helbestvanên nû peyda dibin an derdikevin holê.

Ji naverokê ve helbestvanên Ekola Baban, azad bûn ku her cure naverokekê bi kar bînin. Hejmareke mezin naveroka şî'rê li ser destê helbestvanên wekî Nalî, Salim, Kurdî pêş xistîye û naveroka helbesta wan di asteke bilind de ye, lê digel vê jî ne di asta ereb, tirk û eceman de ne. Ji bo edebiyata kurdî ya wê rojê û taybet mebest û navroka daşorîn, serbilindî ne lê ne di asta hewcedariya helbesta kurdî ya wê rojê de ne.

Ekola şi'îr ya Baban li Başûr li ser gelek cihên din ên kurdan û bi taybetî jî helestvanên Rojhilat bandor kiriye: Hêdî, Hêmin, Şukrî Fazilî, Narî, Adîb, edeb, wefaî... Û wan li ser rêya vê dibistanê helbesta kurdî ya klasîk nivîsandine.

**Çavkanî**

Ebdullah Xidir Mewlud. (2013). Dîwanî Hemdî. Hewlêr: Çapxaney Rojhilat.

Elaedîn Secadî. (1952). Mêjûy Edebî Kurdî. (Çapî Yekem)

Emîn Feyîzî Beg (1983). Encumenî Edîban. Bexdad: Çapxaney Korî Zanyarî Êraq.

Ehmed Deştî. (2001). Dîwanî Deştî. (çapî yekem).

Ehmed Herdî. (1984). Razî tenyayî. Silêmanî (çapî duwem): Berêwerayetî çapxaney Zankoy Selaheddîn.

Cebar Ehmed Hisên. (2008). Îstatîkay Deqî Şî'rî Kurdî-Kurdstanî Êraq (1950-1970). Silêmanî: Dezgay Çap û Pexşî Serdem.

Cemal Hebîb Ebdellah (Bêdar). (2013). Derwazey Şî'r Nasîn. Hewlêr: Çapxaney Narîn (Çapî Yekem)

Husên Xazî Kak Emîn. (2009). Rewtî Nwêkirdinewey Şî'rî Kurdî Le Başurî Kurdistan Le Salanî (1980-1991) Da. Namey Diktora.

Komelêk Mamostay Zanko. (2010). Kurdolocî. Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.

Marif Xezinedar. (2010). Mêjûy Edebî Kurdî (bergî yekem). Hewlêr: Çapxaney Aras (Çapî Duwem).

Marif Xezinedar. (2010). Mêjûy Edebî Kurdî (Bergî Sêyem). Hewlêr: Çapxaney Aras (Çapî Duwem).

Marif Xezinedar. (2010). Mêjûy Edebî Kurdî (Bergî Çwarem). Hewlêr: Çapxaney Aras (Çapî Duwem).

Marif Xezinedar. (2010). Mêjûy Edebî Kurdî (Bergî Pêncem). Hewlêr: Çapxaney Aras (Çapî Duwem).

Marif Xezinedar. (2010). Mêjûy Edebî Kurdî (Bergî Şeşem). Hewlêr: Çapxaney Aras (Çapî Duwem).

Marif Xezinedar. (2010). Mêjûy Edebî Kurdî (Bergî Hewtem). Hewlêr: Çapxaney Aras (Çapî Duwem).

Mehmud Ehmed Mihemed. (1989). Dîwanî Ewrehman Behgî Baban. Bexdad: Çapxaney Zeman.

Mela Ebdulkerîm Muders û Fatih Ebdulkerîm. (1978). Dîwanî Nalî. Bexdad: Ekadîmîy Kurdî.

Mela Kerîm Berzncî (2004). Diktoray Ewyin.

Mesod Mihemed (1976). Çepkêk Legulzarî Nail, Le Çapkirawekanî Korî Zanyarî Kurd. Bexdad: Çapxaney Korî Zanyarî Kurd.

Mihemed Kurdo. (2006). Gean Bedway Şî'r û Ciyawazî da. Silêmanî: Beêweberayetî Çap û Bilawkirdinewey Slêmanî.

Mihemed Mistefa "Hemebor". (2010). Dîwanî Kurdî (Bergî Yekem). Hewlêr (Çapî Yekem: Dezgay çap û belawkirdinewey Aras.

Mistefay Se'îd Mîne. (2007). Pêgeyî Wefayî Lenaw Şaîranî Sedeî Nozdehmî Kirmancî Xiwarûda. Hewlêr: Tefsîr, Bo Bilawkirdinewe û Rageyandin.

Muderis. Mela 'Ebdalkerîm û Mela Kerîm Mihemed. (1378). Dîwanî Mehwî. Sine (Çapî Pêncem): Antşaratê Kuridstan.

Muderis. Mela 'Ebdalkerîm û 'Ebdalkerîm Fatih. (1978). Dîwanî Nalî. Bexdad: Ekadîmyayî Kurdî.

Muderis. Mela Ebdulkerîm Fatîh û Mela Kerîm Mihemed. (2015). Dîwanî Salim. Silêmanî: Binkey Jîn.

Newzad Kelhur. (2008). Rehendî Ayîn le Şî'rî Klasîkî Kurdî. Hewlêr (Çapî Yekem): Tefsîr bo Belawkirdinewe û Rageyandin.

Refîq Hîlmî (2010). Şî'r û Edebiyatî Kurdî. Hewlêr: Çapxaney Aras (Çapî Duwem).

Sidîq Borekeyî (Sefîzade) (2008). Mêjûy Wêjey Kurdî (Bergî Yekem). Hewlêr: Çapxaney Aras (Çapî Duwem).

Sidîq Borekeyî (Sefîzade) (2008). Mêjûy Wêjey Kurdî (Bergî Duwem). Hewlêr: Çapxaney Aras (Çapî Duwem).

Sidîq Borekeyî (Sefîzade) (2008). Mêjûy Wêjey Kurdî (Bergî Sêyem). Hewlêr: Çapxaney Aras (Çapî Duwem).

Seyîd Necmedînî Enîsî. (1368). Dîwanî Herq. Mihabad: Nîknam.

Şukir Mistefa. (2010). Şêx Rezay Talebanî. Hewlêr (Çapî Diwem): Çapxaney Aras.